



Bernameya siruştnasiyê

KURMANJI

**Bernameya siruştnasiyê/
xwezanasiyê bernameyeka
amedekirinê ji bo xwendina
bilind e û bidestxistina
dîplomeya amadebûna ji bo
xwendina bilind armanca
wê ye.**

Bernameya siruştnasiyê/xwezanasiyê ji te re ye yê ku hez dike di warê siruştnasiyê de kar bike. Ev xwendin ji bo domkirina xwendina siruştnasî, matematîk, teknîk û civaknasiyê di perwerdeya bilind de bingeh e.

DU PISPORIYÊN CUDA

Siruştnasî

- Tu dê zanyariyan li ser biyolojî, fîzîk, kîmya û matematîkê werbigirî

Siruştnasî û civak

- Tu dê zanyariyan li ser siruştnasî, civaknasî û cografîyayê werbigirî.

Tiştên ku tu di vê bernameyê de fêr dibî

Tu dê zanîna xwe di warê hevahengiya di siruştê de, şertên jiyanê, diyardeyên fîzîkî, prosesên kîmyayî û matematîkê de pêşde bibî. Tu dê zanyariyan li ser modelên ku di hevahengiya di navbera tecrîbe û teoriyê de tîn pêşxistin werbigirî. Tu dê fikir û teoriyên siruştnasiyê wek beşek ji dîrok û lêkolîna serdem bixwînî.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameya siruştnasiyê de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernamîyên amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yê zêdetir ji yê bernameyên pişeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yê hevbeş yê bernameyan ev in: biyolojî, fîzîk, kîmya û zimanên serdem.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername kûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek biyolojî, teknîka komputer û tîkildariyê, felsefe, cografîya, civaka herikbar, kîmya, avakirin, matematîk, bernamekirin, psîkolojî, teknî, meşqnasî û teknîka înternetê. Ji xwendîngê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendîngê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Di vê bernameyê de, tu dê rêbazeka siruştnasî ya weha pêşde bibî ku tu pê fêr bibî bi rexnegirî bifikirî, bi lojîkî bihizirî, pîrsgirêkan çare bikî û lînerînên sîstematik bikî. Tu dê çavkaniyên cuda hilsengîni û îdiayên ku li ser bingehê zanistî û nezanistî ava bûne ji hevûdin cuda bikî. Tu dê bi pratîkê bi rêya ceribandin, karê laboratûwarê û xwendina meydanî bixebitî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya siruştnasiyê de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê pîrsekê hazir bikî û karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yên giring yên bernameyê ava dibe plan bikî, pêk bîni û hilsengîni.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yên xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwîni, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hîlbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hîlbijêrî.